DANISH HEALTH AUTHORITY

corona | covid-19

Nîşanên COVID-19ê li ser zarokê we hene?

Zarok bi gelemperî nîşanan nîşan nadin an jî tenê nîşanên nerm ên COVID-19ê nîşan didin.

Ez bala xwe bidime kîjan nîşanên COVID-19ê?
Bi gelemperî, zarok dê lawaz û westiyayî xuya bikin û wek edetî dê nelîzin û di çalakiyan de beşdar nebin. Nîşanên din jî dibe ku ev bin:

- Kuxika hişk
- Ta
- Xwe nebaş hîskirin

Dibe ku nîşanên bêhnhildanê yên wekî êşa qirikê, serma û hwd, an jî nîşanên din ên wekî îshal jî hebin. Ev hemû nîşan ne hewce ne ku bi hev re xuya bibin.

Divê ez çi bikim eger zarokê min nîşanên COVID-19ê nîşan bide?
Eger zarokê we nîşanên COVID-19ê nîşan bide, divê ew li malê bimîne. Endamên malbatê yên din jî dema ku mimkun be divê xwe ji zarokê dûr bigrin. Ji kerema xwe vê yekê ji bîr nekin ku bi hezkirin û têkilya fîzîkî a wek hembêzkirin û aşkirinê dibînin, û ev yek ji xwedûrgirtina civakî pir girîngtir e.

Eger ku hûn ji rewşa zarokê xwe bi fikar in an jî zarokê we di bin 2 salî de ye, ji bo nirxandinê û sewqkirina ji bo testkirinê bang li doktorê xwe bikin. Heke hûn hewce nebînin ku bi doktorê xwe re telefon bikin, hûn dikarin ji bo zarokê xwe li ser coronaproever.dk wexteka testê rezerv bikin.

Zarokê min kengê dikare vegere navenda lênihêrîna zarokan an dibistana xwe?
Eger testa zarokê we ji bo koronavîrusa nû erênî derket, divê zarok li malê bimîne heta ku zarok 48 saetan ji nîşanan bêpar bimîne.

Eger testa zarokê we ji bo koronavîrusa nû neyînî derket, zarokê we dikare vegere navenda lênihêrîna zarokan an dibistana xwe, gava zarok baş bûbe, dikare wekî berê beşdarî çalakiyan bibe.

Ji bo demekê piştî her nexweşiyeka bêhnhildanê, normal e ku kuxika kêma zarokan hebe. Eger zarok tendurist û baş xuya bike, ew dikare vegere navenda lênihêrîna zarokan an dibistanê, heta ku ew hîn jî kuxikek kêm hebe wek yekane nîşana mayî.

Divê zarokê min ji bo COVID-19ê were testkirin?
Dibe ku zehmet be mirov bibêje ka zarokê we xwe cemidandiye, COVID-19ê an jî nexweşiyeka din a bêhhildanê girtiye. Testkirin wê nîşan bide ka COVID-19ê ye yan na.

Eger hûn guman nakin ku zarokê we bi COVID-19ê ketibe, hûn dikarin zarokê xwe test nekin. Di wê rewşê de, ya herî girîng ji bo zarokê ew e ku heta ku bi temamî baş dibe li malê bimîne.

Eger çend endamên malbatê nexweş bin an jî nexweş bikevin, mezin dikarin li şûna wan testê bikin, ji ber ku endamên malbatek gelek caran dê heman nexweşiyê bigrin.

Heke hûn di gumanê de ne ku nîşanên zarokê we COVID-19ê ye an jî divê ew were testkirin an na, hûn dikarin bi doktorê xwe re telefon bikin.

05.11.2020